


HEJMAR

5

%100
KURDÎ

pîne

çil çîrokên hirçê hene, giş li ser hirmiyê ne



kovara qerfî û wêjeyî ji panzdeh rojan carekê derdikeve 1-15 aralık (berfanbar) 1999 Sayı: 5 500.000 TL

JI BO DEWLETEKE BERPIRSIYAR; RASTBÎNÎ, LI GORÎ NEXWEŞIYÊN WELÊT PEYDAKIRINA ÇAREYÊN BIKÊR Û BERBIÇAV Û PÊKANÎNA WAN ÇAREYAN, KARÛBARÊN SEREKE NE: A NIHA!.. DEWLET, DIVÊ NEKEVE TAYA MACERAYAN Û GELAN JÎ BI VAN MACERAYÊN BÊYOM NEXAPÎNE. KESÎ QET MAF NÎN E KU TIŞTEKÎ WISA BIKE. DIVÊ YEKSER Û TAVILÊ, DEV JI VÊ "LÎSTIKA KOWBOYTIYÊ" BÊ BERDANI!..*

*Sorumlu bir devletin gerçekçi olmak ve ülke gerçeğine somut ve akli başında pratik çözümler üretip hayata geçirmek gibi bir görevi vardır. Hemde hemen!.. Macera peşinde koşmaya ve bu karanlık maceraya halkları sürüklemeye hiç mi hiç kimsenin hakkı yoktur. Bu kovboyculuk oyununa derhal son verilmelidir!..



Umi Caniç 15

SERDANEKE BEREDAYÎ!

Ew çî bobelat û afateke xedar bû! Clintonê doxînsist û Haroldê zebeşxur, bi darê zorê, xwestin werin ziyareta Pîneyê. Me got, "Kuro dev ji me berdin, gelek karê me yên girîng hene, em nikarin wexta xwe bi we biherimîn." Lê serhişkî û pîkolya wan da navê.

Dawiyê, midûrê me Seyit Karabaş got, ger hûn li civînên AGITÊ Pîneyê bifiroşin û aboneyan peyda bikin, emê ziyareta we qebûl bikin. Li gorî ragihandinê, Clinton li civînên AGITÊ 200 heb Pîne firotine û 50 heb jî abone peyda kirine. Lê ji bo ku Yeltsin pereyê Pîneyê nedanê, şer kirine û loma jî Yeltsin jê re gotiye, "Kurê Qehpikê!"

Di vê navberê de nivîskarê me, ku hem welatîyê "komara dînan" e, gotiye Clinton çûye serdana HADEPÊ: Berde binê te erd e!.. Ji xwe re li karekî nû bigere!..

-Kuro Clinton! Te guhê me qul kir. Kerem ke rûne!..

-Çima lo! Îmana min bi Pîneyê tê: Başûr, bakur, rojhilat, Pîne kovara Welat!..

-Ka derdê serê te çi ye!

-Derdê min xedar e. Kureder Rahmî Batûr, bi riya chatê çav berdaye Monîkaya min! Gotiyê 'Ka were em dakevin newalê! Kuro Rahmî bela xwe ji Monîkayê veke, ezê holika te, di serê te de hilweşînim.

-Seraymîrato! Te li meclîsa tirkan got, hin gav têne avêtin!

-Belê rast e. Ma kê gotiye zilm û zor li kurdan tê kirin û zimanê kurdî qedexe ye!? Me bi çavê serê xwe dît, li her derê Stenbolê "Kürt Böregi" tê firotin. Û her kes jî bi rehetî dibêje, "Kürt Böregi". Xwedê, "Kürt Böregi" jî gelekî baş bû! Ne wisa Harold?

-Na! Ez zebeşê Amedê dixwazim!: Amediyê kêfxweş e, kêfxweş e gozel e, zebeş e dendik reş e gozel e....

-Quzilqurt! Te tatîla me herimand. Ber neavêjel!..

-Zêde nerêse. Wekî din...

-Ha ew pêûskurê Ehmed Huseynî wan peyvên ji qulka mişkan tîne! Bêje wî, bila helbesteke bêtoz binivîse, dema mirov helbestê wî dixwîne, ji ber toz û xweliyê dike bifetise!..Xwedê! Dîrektorê Dengê Amerîkayê yê beşa kurdî Maykîl Çayt jî, ku bi panzdeh zimanan zane, ji wî tiştêkî fêhm nake. Axx... Ez çî mirovekî bextreş im.

-Ma xêr e!

-Xwezî Tansû serokwezîr bûya! Ez bi zorê ji destê Raşan û Nazmiye xelas bûm. Ma ew Silêman û Ecevît çi karî dikin!..

-Ê baş e, tu zilm û zora KNK'ê ya li ser Pîneyê neyîne rojeva cîhanê?



-Qet xeman nexwin! Min ji Kofi re got, emê li şûna KNK'ê Pîneyê bikin endamê Neteweyên Yekbûyî. Bila KNK'ê jî piştê stûyê xwe bixurîne!..

-Prêzeya gerîndeyê me çawa ye?

-Tew tew tew!.. Hirç û govend!.. Got, ez kil bikim kor kir!..

-Bihecime têdehato! Pîsê heram! Ka wê şimikê!..

-Weylo! Ew tu yî! Kuro Harold zû! Lingo ez qurban!..



HEY LO LO DELAL

Hey lo lo delal, heylo lo delal
Bi telefona desta dibê delal
Bi faksê dibê delal
Bi modemê dibê delal
Bi internetê dibê delal
Computera ber dilê min xeyo lo lo!

Delêlo heyran
Berrîka Mêrdînê berrîke dûz e
Pozê volvo û mercedesan
bi ser da xûze

Nava sîng
û berê min evdala Xwedê
Bi dolar û mark û kronan
nûze nûz e xeyo lo lo!


Delêlo heyran
Ez ê delalîkê malê bi rêkim
Wezê taştêyekê
ji delalê malê ra çêkim
Wezê tamam kîvî, ananas
û avokadoyan jê re lêkim
Eger çîma delalê malê pê neyê
Wezê cotê sîlikonan
jê re pêşkêş kim xeyo lo lo!

Mahmûd Lewendî

HÊZÊN PDK'Ê TEVÎ BI HEZARAN LÊŞKERÊN TIRK ÊRÎŞ DIBIN SER HÊZÊN PDK'Ê. KU BERÎ NIHA BI ÇENDEKÊ, JI PDK'Ê DAWAZA AŞTÎYE KIRIBÛ LÊ, DIYARE EV ÊRÎŞ LI DJI KE YE!



Li Bolyê jî meke, ji bo ku derdê xwe arî zimên, ji Walîyê Bolyê şîmaq xwar û hate birçavkirin!




Teqoci?

Wezaretê me, hemû malbatên kurd hişyar dike û dibêje zarokên xwe neşînin dibistanên tirkî, lewra ew ji aliyê nasnavê ve asîmîle dibin. Yê ku van karan dikin (Emerîka û Îngîltêre) dixwazin gelê kurd bê nasname bihêlin.

Wezaretê Perwerdehiyê ya Iraqê



Li Amedê hunermendê herêmi Besîr GUZEL, ji ber ku di şeva bo alîkariya depremezede yan a seqetan de strana 'Ay lê Güle' got, bi dehmeh cezayê hepsê hate cezakirin. Ger GUZEL di nava pênc salan de vê stranê bêje, wê cezayê xwe bikişîne!



Nanê Sêlê


Mudiriya Giştî ya Ertiriyê daxuyaniyek weşand û got: "Dê êdî polîs ji gel re baje 'Mirza'... Lê herman rojê polîsên sivil li Mardîne li Kirasîyefiroşokî xistin û kîtin ku kirasîyefiroş bo hefteyekê raporê bistîne




Sersariya dewletê ya bo depremezede yan dide navê!



Li Batmanê, 37 mamoste ji bo ku çûbûn sersaxiya kurda ku di dema çalakiya li dijî konsolosa Berlinê ya Israîlê hatibû kuştin, berî Roja Mamosteyan hatin sirgûnkirin!





BEGÊ ME!
DIDE TIRAN Û
RADIKEVE.
KU QIYAMET RABE,
NE YEMA QEWADE

REQADAL
RUQADA!



LI BER XWE
BINER KURO!
KUÇIKÊ KURMÊ!
KURO!..

BI PEY MIN
BIKEVIN KURO.
EMÊ
DI VÎ ALÛDE
BIGIN!..

ÇOT!


AXH!..



HA... ÇI...
ÇI DIQEWIME LI VIR?
HÛN KÎ NE??

GÊTÊ
KERKER!
KUTAYO..

BIBORE BIRA!
VÎ KÛÇIKÊ KU
RÊBERIYA ME
DIKIR, WIENDA
BÛ, DIBE KU...



KA XWE BIDE NASÛN BIRAYO!
HÛN DIÇIN KU DERÊ?
KÛÇIK
RINA ÇI NÎŞANÊ WE DIDE?

ZIM!



EM JI KOÇERINÊ BEHECÛN...
EM LI WAREKÎ DIGERIYAN. PIŞTRE
VÎ KÛÇIKÎ RÊBERIYA ME KIR.
KU TU PÊ ZANÎ, BÊTE, LI VAN DERAN
JI BO TALANÊ CHÊ BAŞ HENE?



BIRAYO! EV DER
WELATÊ MEDANE.
ANGO YA ME
KURDAN E.
KU HÛN MÊVAN IN,
SER SERA SER ÇAVA!
LÊ HÛN DOZA TALANÊ
BIKIN, BICEHEMIN!..

TU ÇI DIBÊJÎ KURO!
KU KÛÇIK
LI KU DERÊ
BISEKINE,
EV DER A ME YE!..



HERÊNE ŞERINO!
VÎ
SAX NEHÊLIN...



DIYAR BÛ...
EV NEHATINE DIZINÊ,
HATINE KU
SIVÊN BIKUTIN!..



HEEYTT...
BI NAVÊ
ZERDÛST!..

TEQ!..

ÇOT!..



DITIRSIM, EV
NEXNESÎ ZÊDE
BIDOME. EV DERO
XELAS NABE, XELAS!



PIŞTÎ BÎSTEKÊ...

VÊ REWISÊ EZ
ACIZ KIRIM. DIVÊ EZ
HAYA GUNDIYAN PÊXIM. KA
RÎSPINÊ ME DÊ ÇI BÊTE?

REQ!
RUQ!



WEXTÎ BIGIHÊM GUND.
NIHA, WAN GELEKÎ
BÊRIYA MIN KIRINE.
XWEDÊ! KURMÊ
KEJÊ TÊNE MIN!..

EZ KEJÊYÊ NIZANIM,
LÊ, KU ŞENIYA GUND
TE BIBINE, WÊ KÊFA
GURÊ PÎR BIKE...



NIYAA!




RAWESTE XERIBO!
TU DIÇI KU DERÊ?
TU LI MEDYAYÊ ÇI DIGERÊ?
NELIV!..
AN NA EZÊ VÎ KEVIRÎ
RAKÎŞINIM SERÊ TE!




XERIBÊ ÇI KURO?
EZ QONANS IM!..
TE ZIRAVA MIN QETAND.
EV ÇI QESMERÎ YE? EV
KEVIRGÎYE? KA ÇEKA TE?

RÎSPÎ APÊ MÛSA
GEK QEDEXE KIR.
DIBÊTE, WÊ
PÊ VAJOYA ASTINÊ
DEST PÊ DIKE.

AŞTIVA ÇI KURO?
ZILAM HATINE BER
DERÎ. MIN BIBECEM
APÊ MÛSA...



Li Derve Çi Heye Çi Tune?



Sera 1995 de sodir ez şîyo istasyona Strenê Mûnîh, wija ra jî şêrî Frankfurt. Verecû mi wast ke rojname bicêrî. Hona çever rane bibi. Verê çeverî de vinderto milete niyada. Milet yeno, millet sono. Pêrin de telaş bi, pêrin de stres bi. Vazene, ginene zûvînro, remenê ez se vajî, to vatê qey mulecike, cutir bavulene pêye xo de oncenê. Mi wija dî ke mileta Japon bavulene rindekon kaş kenê. Tameşekerdena na millet de ez biyo vind şîyo. To vatê qey ezo verê çemê Firat de ro, niste ro ave fetelin. Verecû di kurdî û dima jî di tirkê naskerdey amey leye mi. Na raye jî ma zuvin de qışey kerd. Porê min çîno, la belê hevalê bîn maşallah por şaybî. Ya jî ez vajî ponc qafîke şayvime. Nika, eke istasyone trene de ponc qafîke şayke amey têlêwe, polisê Alman lona xo ra vejîyenê. Zey verg kuno horte gore.



Ti nêzanêê kam poliso, kam polis niyo. Kotî ra yenê, kotî vîndenê. Zey xizir hazir û nazirê. Hata cilê mordem qoseno xo kena derg. Zey Faruk Sûkan nabzê hemû milete ecnebî zonenê. Ma jî polîtîka o çaxî ser ro qışey kerdê. Di hevalo xo vês-naybi, min wast ke şîrî manheim. Dukan jî hortera di hîre dakika de biyene ra. Bira di sivil amey leyêê ma, dima jî eve hêrs: "Polizei pasaport kontroll!" Min jî va verêcû şima huviyetê xo vejê. Mêrikon vet, dima jî ma pasaportê xo day ci. Min bawer kerd ke endi mesele qediyê. Pasaportên ma de problem çinebi. Hemû huviyet rind kontrol kerd, dima jî va, şima gereke bêre karakol. Ma kerdîme xo ver berdîme karakol. Ez pîle pêrine biyo. Ez tenya kerdo ode. Dês de nexşeya (xerîteya) Kurdistan darde (vilêncik) kerdbî. Va ke: "Ti tirkê yan jî kurdê?" Min vat kurda. Va ke kincanê xo vejê. Polisê Alman zey polisê tirkan niyê, îşkence çînyo. Yani mordem nêterseno. Min paltoyê xo, çakêtê xo, îşlig û atlêta xo vet, cora biyo rût. Dima min pers kerd, nika şima corê min dî, wazenê cêr jî bivîne? Va ke beso. Dima jî min onçîna pers kerd: Sima pasaporta mi diye. Çi heq ra şima min tiya niya kenê rût? Ez hemwelatê (vatandaş) Almanuno. Ey jî va: Ama birêz İzik (Almanî nameyê min niya wanenê) ti kurdê. Welat de kes kurdîna min qêbûl nêkerdê. Tiya sayiya Almanan de ez biyo kurd.



Çiroka min, çiroka Sîno ye. Sîno li gundekî navçeyê bêmal û milk; bê-êl û eşîr bû. Çend heb mirîşk û elokên wî hebûn. Erê Sîno xizan û bêkes bû, lê belê, ew ji nava xwe têr, serbilind û serhişk bû. Her kesî noqa xwe jê vala dikir. Sîno hem ji bo keriyê xwe yê elok û mirîşkan û hinekî jî, ji bo xweparastinê bê "ço" nedigeriya. Lewre, jê re digotin Sîno. Tew ku jê re digotin Sînan, kêfa wî dihat, serê wî digihîşt ezmanan. Li paş wî henekên xwe pê dikirin. Navê wî kiribûn Sînê Eloka... Kes nizane ji bo çî, Sîno bar kiribû, hatibû navçeyê. Tu kesî ew nas nedikir. Gava ew li çarşiyê dimeşiya, tevî şelwarê wî yê bi pîne jî, te digot qey ew ji malbata Bedirxaniyan e. Li bajêr(!) jî, Sîno dev ji çoyê xwe bemedabû. Çarşiya navçeyê bi qasî dused mîtroiyê bû. Ji jor heta jêr, dikanvanan li ber deriyê dikanan maseyên biçûk datanîn û li dora maseyan li ser kursiyên qinabî rûdiniştin. Yan fesadî dikirin, an bi hokehok dipeyivîn. Li ser maseyan; bi sêberk, nehberk, domîno, dame û kişikê diştin. Dikandaran meraq dikir; gelo Sîno kî ye, çî ye? Rojê dikandarekî xwest Sîno biceribîne, bê ew çî kes e. Rabû ji erdê

şijikekî biçûk hilda û kir nava herdu tiliyên îşaretê û tiliyên xwe mîna kevanekî rakîşand û paşê şijik, bi pêş de serbest berda. Şijik mîna tîra ji kevanê xelas bûbe, got "pivw" û çû got "teq" li qotê serê Sîno ket. Sîno di cih de rawestiya, li derdora xwe nihêrî. Fêm nekir ku kê şijik avêtîyê. Sîno, rasterast û bi dengê bilind got "Kê şijik li serê min xist, ez di jina wî nim!.." Rojê din, dikandarekî din şijik li piştê Sîno xist û serê xwe berda ber xwe. Sîno dîsa dest bi çêran kir. "Kî keviran davêje min, ez jin û maka wan ga bidim!" Sîno hatibû naskirin. Ew, ne bedirxanî bû. Ew Sînê Eloka yê xulqteq û xeberok bû. Kengî Sîno derdiket çarşiyê, ji dikanan şijik û zixur lê dibariya û her carê Sîno radiwestiya, dest bi çêrên negotî dikir. Rojê dîsa Sîno ji xwe re li çarşiyê dimeşiya; kê şijik avêtê û li deverêke din nihêrî. Sîno ew ditîbû. Çû di ser wî de sekinî û çoyê xwe lê bilind kir, got "Ez di jin, qîz û bûka te..." Mêrik, wekî ji wî re nehatibe gotin, li karê xwe nihêrî. Sîno bi vê yekê bêtir qehirî û hêç bû, got "Lawo! Xuyaye ev meriv bênamûs e. Ma qey tu kesê wî tune ku li ser wî qail nebe ku ez di jina wî jî n..." Deng ji tu kesî demeket. Sîno da ser rîya xwe. Sîno gelek şijik xwarin û gelek çêr kirin. Roj hat, Sînê Eloka kal bû, qedera wî tamam bû û bi rehma Xwedê, mir. Havîn qediyabû, payîz hatibû li şûna havînê rûniştibû. Û baranên payîzê dest pê kiribû. Darbesta Sîno di çarşiyê de, di binê xunavê de, li ser milên zilaman derbas dibû. Baranê hêdî hêdî kafenê Sîno yê bêtabût şil dikir. Her dikandarê ku dibihîst, ew darbesta Sîno ye, mîna berê şijikek diavêt ser darbestê û paşê diçû diket bin darbesta Sînê Eloka. Dema darbest gihîşt goristanê, bi hezaran kes li dû darbestê bûn û bi hezaran şijik li ser darbestê kom bûbûn. Sîno nema dikarî çêr bikira. Sînê Eloka û şijikên wî, bi hevdu re kirin gorê û ew veşartin. Libên baranê mîna şijikan li gora Sînê Eloka dixist. Şênîya navçeyê bi xemgînî ji goristanê vegeriya.



OO..XEYR AMEYÊ BIRAZA...
XANIM XANIM!
BIREMI MEYMAN AME.
ŞANDE
MANGA BIBIRNIM!...

XEYRÎ
MIYAN DE BÊ!
SENÎNA?
RINDA!

NO WINA
NÊBENO LA!...
MA
EZ!...



HÛ HÛ...
TO DA YÊ EZ MAÇÎ
BIKER.DAYÊ?
DELALÊ MIN...

* MABENÊ ŞIMA DE KESO KE
QEÇIKÎNA XO DE
QILÎNCELÊ (beq) PUF KERDE, ESTO?



CENIYA TO
XERÎB MERÎBA, FEQET
KARÊ XO
RIND Û REW MÛSAYA!..

DEDO DEDO!
MIN ..
NO HARDE DÎ,
WA Ê MIN
BO?

BERE CADÊ
CI DE VIRADE.
WAYIRÊ CI BENO,
WA
SERÊ MA MEKEWIO
BELANÊ!..




VANÊ, SÎRK AMEYO
SÛKE Û
XEYLÊ JÎ HEYWANÎ
ESTÊ!..

NÊNÊ...
EZ BAWER
NÊKENA!



HIMM HIM....
ŞIMA ZEYTÎNAN
WINA KENÊ HAZIR?!
TUVÛ!..

EHE
PŞKÛL...
EHE!
HE L!
HE L!



hamdi



Ez bawer dikim EV WÊ RÛMETê FIKRÊ min bigrê!

Ez jî der-diketim XWARINê Ka em herin...



BIRAKO! KÊFA MIN GELEKÎ JI TE RE HAT. DIXWAZIM TE HÎNÎ XWENDINÊ BIKIM. ÇI BÊ SERÊ MIROV JI NEZANINÊ TÊ! KA BÊTE A...



ÇIMA PIŞTÎ HEVŞABÛNÊ? ÇIMA?

Wî! EV KIRASÊ HERÎ ECÊBÊ, KU MIN PIŞTÎ BIHEVŞABÛNÊ LI XWE KIRIYE...

C E M Î L
D E N L Î

TARA BÊJINGÊ

MA SÊV NAYÊ XWARIN!

Bi zarokî, wexta digotin, "Xwedê Teala Adem avêtiye bihuştê û tenê darek lê qedexe kiriye ku fêkiyên wê nexwe", ez şaş dimam. Min digot, "gelo ji bo çi? Çi bi wê darê ve heye? Li nava bihuştê, sînore dar û beran tunebû û dareke qedexel!" Lê, bi rastî, dîsa jî Adem ji wê darê nexwaribû. Xwedê Teala Hewê ji parsûyê wî xuliqandiyê û bi wê, rê li ber şaş kiriye. Peyvek heye, dibêje, "Bela mirov ji ber lingê wî radibe." Ê Adem jî bela wî, ji parsûyê wî... Paşê Hewê tê, wî li dara sêvê sor dike û taliya tafî hûn dizanin, çi bi serê rebeno de hatiye; ew avêtine vê dinyaya ku îro gihîştîye radeya globalîzmê.


Dilê min bi Adem dişewitî. Bi zarokî û kawiktîya xwe, min digot ku, "ez bûma, min dar lê qedexe nedikir. Ku min qedexe bikira jî, ji bo sêvekê, min cezayekî ewqas mezin nedidayê. Ji bo çi? Bihuştêke bê ser û ber û tenê ji vê darê nexwe!" Ez difikirîm ku ez di şûna Adem de



ŞEV ÇU MA TU EDÎ HEW TÊ LO!



ÇELIM DE KENDIMIZ DEN GEÇELIM!



XANÎ BÛYE ZINDAN TÊ DE RANAZEM!



WEYLAL!



GIRARA QEREÇIYAN

HELÎM YÛSIV

Pîne û Ziman

Mirovên kurd bila matmayî nebin, ku sibehêkê rayedarêkî dewleta tirk ji xew rabe û fermanekê yan daxuyaniyekê bide û bêje, "Divê jinên avîs ên kurdan dema bizên, tev keçan binin. Çimkî xort bela serê dewletê ne!" Yan berwajî vê yekê bêjin, "divê gîş kuran binin, çimkî jinên kurd bingeha parastina çand û ziman in û zû bi

zû asimîle nabin, yan rayedarek bêje, "bila baran li Kurdistanê nebare, yan ba lê neyê, yan roj lê hil neyê."

Daxuyaniyên bi vî rengî gelekî normal in, gelek caran ne kenê mirovan bi tenê, hetanî bi kenê gura tînin. Dema rayedarêkî payebilind dibêje, "zimanê kurdî bi kêr nayê, ya li paşketî ye, ya zimanên bi hev negirêdayî ne, bi kêrî televîzyon û radyoyan nayê hwd." Di bingeha van nêrînan de, dilbijandinek ji zimanê kurdî re heye; bê çawa hetanî vê sedê, bi tevayî talan û tune nekirine. Ev daxuyani di hundirê xwe de dagirkeriyê êskere dike û siyaseta qirkirinê dide pêş.

Ev daxuyani, mîna ez, "xwedanê vê nivîsê" yê, ku nizanim bi zimanê tirkî bêjim zimanê, "tirkî bêkêr e", ji ber dema Silêman Demirel dipeyive, ez ji gotinên wî fêhm dikim. Ji ber ku nivê gotinên wî bi zimanê erebî û kurdî ne, lê dîsa jî ne mafê min e ez bêjim zimanê tirkî ji çend pîneyan hatiye sazkirin;

pîneyekî erebî, farsî, kurdî, pîneyekî latinî û bi çend gotinên mîna "ler, ben, sen" bi hev dirûtine. Ji ber bi kêmanî 60 mîlyon mirov bi vî zimanî diaxive û li xweşiya wan tê û pê bazirganî û siyaseta dîke; her wiha pê distrên û dîlanê û ken û girî jî dikin. Lê yê rayedarên tirkan, ji mafên wan e ku zimanê kurdan ji devê wan bikişînin û zimanekî ser kêfa xwe li şûnê biçînin; di bin behanên "hincetên" bêtate de û tirsê parçebûna dewletê derdixînin holê.

Lê di vê dawîya sedê bistan de, ku bi hetanî televîzyonên çirçirk û moriyên çêbûne; televîzyonên taybetî lawiran, sporê û mirovên kerr û lal çêbûne. Lê ji bo 40 mîlyon kurdî çênabel! Ev tevgera rayedarên tirk, çiroka yê mihelmî tîne bîra mirov. Yê mihelmî dilê wî dibijîya goştê kerê, digot "guhên wî mîna yê kîvroşkan in!". Dilê komarê xwe nû dike, ku zimanê kurdî tune bike; dibêje wê perçebûnê çêke, yan demê li dijî rastiya encamên şerê

zimanekî li paş e, ne li gofî demê ye hwd. Lê hema zimanê me çawa be, sar be, be, reş be, şer be, tal be, tîrş be, quzilqurt be, em pê qayil in. Eger ev ziman di riya xwe yê re hatibe wê çîhanê, yan di riya Xwedê re hatibe, incax wê di riya wan re ji cîh rabe. Lê ez pê zanim, zimanê kurdî bi mîna reşikê şevê, şevê carekê dagirkerî vediciniqîne û dawîya dawî, wê di tirsê de derkevin.

Pîne û Aştî

Piştî ku dengê aştxwazan bilind hinekan ji rayedarên dewletê qîr kirin kirasên xwe çirandin û gotin: "Çawa ke hene nêzikî rûmeta komarê dibin! We me demokratîk û ewle ye!" Bi rastî rûm komarê, rûmeta berjewendiyên rayedarê ên kesane ne, ku ji serê Kurdistanê sê digirin. Lewre daxwaziyan wan her ga demê li dijî rastiya encamên şerê

hinê dev ji hemû bihuştê berdaya û ezê
 e li bin vê darê veketima, hevala min di
 a min de, meyê stranên bihuştê big-
 ber xwişîna bê, dar û ber û çivikan... Ezê
 biçûma û bihatima. Misoger tiştek tê de
 xwe Adem jî wisa kiribû (dibêjin law li



ku Adem sêv jê nekiribe û Xwedê Teala
 bi ser serê wî de xistibe û cara yekem
 rûkêşê (yerçekim)" wî dîtibe. Lê ji ber ku
 na wî tunebû û li wê dinyaya bi tenê, tu
 wî ji fizîk û endezyariyê tunebû,
 re û gotiye, "hey ev sêv ketiye, balo ez
 bila bi erdê de neçe."

, dijminan bi hezar salan, ax, ziman,
 anî, hemû welat ji me standiye, hînê em
 van nakin ku yekî jehrdadayî bikin û her
 hêrs dibin, agir berdadin laşê xwe. A
 dibêjin Hewê ew lê elimandiye.
 ya dîrok û mîtolojiyê - ez dibêjim qey
 nivîsîne- ya herî mezin jî li pîrêkê, ev e.
 ew lê sor kiriye... Ma çima qey totik di
 dem de tunebû, ku bi xwe bifikiriya,
 yan jî bigota, "Xwedê li min qedexe
 ez naçim." Û eger dîsa jî ez di dewsa
 de bûma, ku wê bigota, "Heydê em
 wê bixwin", min nedida ser xatirê wê û
 ma. Ji ber ku evîndara min, ew tenê bû
 e dinyayê -çê û xirab- yeke din tunebû.
 n, Xwedê Teala ew ceribandiye. Ew, her
 rov, ji berî ku wî bixuliqîne dizane û qed-
 êrf bi herf dinivîsîne. Gelo çi meraqa vê
 dinê heye ji bo wî? Ma qey tenê ji bo
 fermanên xwe pê bide fêmkirin... Wê
 jeh û bihuşt bi mebesteke turîstîk hatine

Xêzên Beredayî

MÎRZE MIHEMED. Macerayên TURBO!..

camerfiraxsho@hotmail.com




Kurdistanê ye.
 Her cara ez van daxuyaniyan dibîhîzim
 yê cawfiroş "cifiroş" tê bîra min. Cawfiroş
 diçe gundekî, ku cawê xwe bifiroşe. Berî bigi-
 hêje gund, pêrgî mirovekî gundî dibe ku
 kirasê wî peritiye, bi hetanî ber huştê wî
 rizyayî ye; ger tayek ji kiras bê kişandin, wê
 sed pîne jê bikevin. Yê cawfiroş gotê, "Gelo
 ji gundiyan re caw lazim e?" Yê gundî, "Ji min
 re ne lazim e, ger ji gundiyan re lazim be!
 Ev jî komara tirk e. Ma lawo deverêk di
 bedena we de nemaye ku zirar ji şer nesî-
 tandiye; ji şaşikê hetanî pêlavê we pînekiriye:
 Aborî, civakî, siyasî. Ev gîş li zengilê didin û
 qulqulkî bûne, tu pîne jî nema dikarin "ewre-
 ta" wan veşêrin. Hîn jî dibêjin aşî ne gerek e!
 Ger ji we re ne gerek be, tew ji tu kesî re ne
 gerek e.

ZILITO

rewşa wî rewşa kerê nêr e

comel


camerfiraxsho@hotmail.com




Rahmî Batur



ÇAVÊN TE MÊRKUJ INI! TIR JI WAN DIWESIN Ê HEVALÊ...



TE DIGO QEY DIBÊJE JIXWE EZ NE EV IM. (ji kara kitap'ê)



10 XWENDEVANÊ HÊJA (PIR HÊJA) JI ME RE LI CIYÊKÎ NÊZİKÎ TAKSÎMÊ XANIYÊK LAZIM EI EZ GORÎ...

Komara Rexnekoran!..

Rexne li milê min birn e! Çend roj berê, li NÇM'ê provaya lîstika Komara Dînan hebû. Berî her tiştî, Xwedê me ji Teetra Jiyana Nû mehrûm nehêle, ji ber ku wan jî em ji vî lîstikê mehrûm nehiştin, her çiqas dîne wan zêde har bin jî... Efedimê xwe re bêjim, piştî lîstikê, ew dînen li ser dikê, derî li ser temaşevanan dadan, nehiştin kes derveve derve. Di nav rehên xwîna me de tirs bi şid liviya... Me bi lerz û tirs bi wan ve zarezar kir:

-Eman... zeman.
-Qurban.. heyran...
-Hûn ne dîn in, dîntiya we rol bû, di lîstikê de bû.

-Me berdî, jin û zarên me hene.. (yê min tune ne) me berdî.. Piştî ku ew dînen li ser dikê, têra xwe bi me kenîyan, daxuyaniyek nerm dan:

-Netirsîn! Tenê em dixwazin, hûn dîtin û rexneyên xwe yê li ser lîstikê diyar bikin...

Hinekî bêhna me vebû, tîrsa me danî... Lê piştî wê tîrsê, ka ew mîrê ku biwêrîbe rexne bike!?. Me hemûyan bi dengê qîr kir:

-Ji vî lîstikê çêtir, tu lîstik nehatiye darê dinyayê!!! Me xwe negirt, carekê din qîr kir.

-Ne jî wê bê!!! Belkî ez bêjim hûn bawer nekin jî, lê bi vî pesindana me qalî nebûn:

-Em ne tenê pesindanê dixwazin, rexne jî lazîm in ji me re... Ew dîn ne wekî dînan, wekî feylesofan li ser dikê rûniştin û guhên xwe li rexnan fireh kirin. De ka em jî guhên xwe tevî guhên wan bikin, da çî rexneyên giranbiha derketin holê. Lê ji bo nebe fesadî, em navên rexnekarî nadin. Fermo:

-Bavê Bavi, dema li goristanê ji bo beqî bixapîne, li mirîşka xwe digeriya nejdil bû.. Rola xwe baş nelîstiye, nejdil e, çîma? (Xwediyê vî pîrsê ji Azadiya Welat bû.. Ox!. Piçek bêhna min derket, ez bê fesadî naqedînim, bi Xwedê!) Yek li hemberî vî pîrsê rabû:

-Nejdil bû, ji ber ku ew ger bi rastî jî ne ji dil bû!. Yekî din li hember herduya jî derket:

-Na! Xeletiyan nekin heval! Gera wî ya bo gerîna mirîşkê teqîşq bû.. Ew di rastiya xwe de li welatê xwe digeriya.. Li dîrokê digeriya... Yek jî li vî rabû:

-Şaştiya mezin tu dikî heval! Ew ne li dîrokê, li dîk digeriya..

-De here lo, dîne heram!..

-Ji dînan re nebêje heram, em pê diêşin! Tam temaşevan li ser mirîşk û teqîşq û dîk û dîrok li hev germ bûbûn, dengê xermî bilind bû:

-Lîstik pir xweş bû, lê min fêmkir..

-Çîma?

-Ez bi kurdî nizanim...

-Baş e, tu fêmkirî jî çêdibe! Dengê din:

-Min jî fêmkir..

-Lê te çîma fêmkir?

-Hûn peyvan zû li pey hev rêz dîkin...

-Baş e, nefêmkirina te jî, ne tu xem e!.. .. û. û dengê din:


-Ji ber ku nehate fêmkirin, ez dixwazim lîstikê sehne bi sehne ji we re binixînim... Lîstikê sê saet dom kirbû û li gorî daxwaza vî camêrî, bi hindikayî lazîm e, em sê saetên din jî, li wî guhdarî bikin... Min hêz ji xwedayê xwe xwest û min xwe li derî da! Deriyê reben li ser piştê dirêj bû... Dema ez derketim derve, bi xwe hesiyam ku milê min ji cih derketiye, lê bawer bikin ez dîsa jî erzan fliitûm. Ku derî neşkesta û ezê hem ji milê xwe bibûma û hem jî minê li wî camêrî guhdar bikira, minê çî mala xwe xera bikira?!

e-mail: r_batur@hotmail.com



RIZO DIZO

İmam Cici



PÎNEYEKÊ JI AKBÛLUT Û DEMIREL RE BIŞÎNIN!..

Dinya çî xerîb e! Mehek maye ji sala 2000'î re, hê jî "Gelo kurd hene tunene, kurdî heye tune, kurdî ne zimanê nivîskî ye." û hê gelek tiştên din, ên hîç û pûç, di nav devê hin giregirên Tirkiyeyê de diloqe û digevize.

Dev ji edebîyata klasîk a kurdî berdîn, ku ji sedsala 11'an û vir ve her berdeyam e.

Dev ji edebîyata nûjen a kurdî berdîn, ku bi sedan tişt hatine afirandin.

Dev ji folklorê devkî ya kurdî berdîn, ku nêzî 30 milyon kurd hê jî, wê di nav xwe de zindî digrin.

Dev ji medreseyên kurdî yê berde berdîn, ku bi hezaran suxte û feqî bi zimanê kurdî perwerde kirine.

Dev ji Kurdîstana Başûr berdîn, ku niha ji dibistanên seretayî heta zanîngehê, tê de xwendekar perwerde dibin.

Dev ji dengbêj û hunermendan berdîn, ku bi hezaran kasetên kurdî derdixin.

Dev ji 3000-4000 kitêbên kurdî berdîn, ku heta niha derketine.

Dev ji 1200 kovar û rojnameyên kurdî berdîn, ku heta niha hatine weşandin.

Dev ji televîzyon û radyoyên kurdî berdîn, ku li derveyê welêt û li hundirê welêt weşanê dikin.

Hema hejmareke Pîneyê bigrin û ji wan kesên ku dibêjin "Bi kurdî xwendin û nivîsandin nabe" re bişînin, bes e bi min! An jî parçepîneyekê ji wan re bişînin, bila wê eyba xwe pîne bikin!

Gerîndeyê Giştî yê Pîneyê Mr. Mazlum Dogan nifireke komputerwarî li nivîskarên xwe yê dirêjenivîs kiriyê; ger nivîsên xwe kurt nenivîsin, bila vîrus bikeve komputera wan.

Min rûpelên sê hejmarên Pîneyê bi ser hev de qelibandin û qulupandin, min nihêrt yek ji wan kesan ez im ku nivîsa wî kurt e. Lê dîsa jî vîrus ketiye komputera ber dilê min. Ne tenê komputer, her weha ketibû nav nivîsa min a hejmara duyemîn jî, ku li ser Can Yücel bû.

Dîsa min gotibû her hejmarekê, ezê eşantiyonekê bidim we. Lê diyar e eşantiyona me heta diçe çapxaneyê ji ser rûpelên Pîneyê dişemite û dixuşike.

Herî Tiral

-Yê herî tiral bila destê xwe bilind ke!

Bêyî yekî hemûyan destê xwe bilind kir. Jê pirsîn:

- Çima tu destê xwe bilind nakî?

- Di xwe re nabînim!

DOZO

Biracan



WEŞANÊN KURDÎ Û LI SER KURDAN

kovar û pirtûk
Ey Avê Av * Şêx Sen'an Feqiyê Teyran
Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê
Vate hej. 9 payîz (kirmanckî)

kaset
Koma Zelê Melê (kirmanckî) Şêlê Pena
Kawîs Axa Lawik Kom
Ali İhsan Doğan Gülderen Eller Kom
Koma Xelikan Gula Mamê Kom
Koma Cotkar Welat Xwîna Şehîdan Medya

Xani'den Mem'e Bir Buket Çiçek H. Mem Enst. Kurdî ya Stenbolê
Görüş ve Anılarım Hesên Hîşyar Med Botan Direnişler
(İngiliz ve türk belgelerinde) Kalman Med Kürt Davası ve Hoybun Prens Süreyya Bedirhan Med

*Xwendevanê hêja! Kovara tirkî Milliyet Sanat li ser edebiyat kurdî dosyayeke berfireh amade kiriyê û hûn dikarin jê sude wergerin.

T
A
Q

Teyran

Ender Özkahraman



Bi texmîndî min, berî vê bi 300 sêlên, li navçeya Wanê Miksê zûnêyê dijîyê. Miksiyên ku wê demê li herêmeke fireh belavbûne...

DISA GÛ BÛ?



... Qet diyor nebûye ku wê kengî rastî vî zilamî bîn...

WITÎ?... EV JI KU DERKET

BIRANO!!



CARNA LI QEHWEXANEYÊ...
BIRANO! BAWERÎYA XWÊ BI GOTINA AXA Û BEGAN NEYNIN. HER GOTINA JI DEWÊ WAN DERDIKÊ...



CARINA LI ZEVIYAN...

... HER GOTINA KU DERDIKÊVE RAST BÛYA, ÎRO EM EVQAS XIZAN Û BELENGAZ NEDIBÛN...



CARNA BERTÎ ŞEREKÎ LI NAVENDA SÛKÊ...

BIRANO! BAWERÎYA XWÊ BI PADÎŞAH NEYNIN. EV ZILAMÊ DÎN, TENÊ JI BO NEFSA XWÊ, WÊ DIAVÊJE BER RIMAN! ŞER NEKIN!...



CARNAJÎ...

TUMP!
TUMP!



Demê deriyek bi xurtî dihatiye kutandin, rastî vî zilamî dihatiye...

XWÊ PAŞPERDE NEKIN! DERKEVIN JI KANÎNE AVINÊ VEXWIN. DI GOLÊ DE AJNE BIKIN, AVÊ BIDIN HESPAN!.. RAKETIN NE TÎŞTERI BAŞ E, BIRANO!

AY!..




Miksî beyrî ku şîretên vî zilamî pêk bînin, bes lê guhdarî dikirine. Lê wî, bê westan û rawestan miksî agahdar kirine...

BIRANO!.. NEKEVIN TANA PERE, MEDEM Û PAYEVAN!.. YÊ BIKEVEJÊ NALIFITE. ÇAVNEBARTÎ NEXIŞNA HERT GİRAN E...



Lê rojê, nema sebra miksiyên bi vî zilamî tê... Ewî tik û tene hiştine...

BIRANO!.. PIÇÊKÎ LI MIN GUHDARÎ BIKIN...




TUMP!
TUMP!
DERÎ VEKIN BIRANO!..



PIŞTÎ KU ZILAM FÊM DIKE, WÊ NEMA KES LE VÎ GUHDARÎ BIKE, BERÊ XWÊ DIOE ÇYA Û BANIAN...

LI MIN GUHDARÎ BIKIN, BIRANO!..

... Û ligel teyrên wê derê dest bi axaftinê kirîye...



PIŞTÎ DEMEKÊ, KU ZILAM GÛYE KU DERÊ TEYR JI BER BI VÎ ALI VE FIRIYANE...

RRİK CİK CİK VİK CİK CİRİK RRİK VİK CİK CİRİK VİRİK CİK




LI WIRE!..

ÊDÎ, CÎH Û WARÊ KU ZILAM LÊ YE, JI MIKSÊNE JÎ DIHATÎYE FÊMKIRIN!..



JÎ BER HEVALTIYA WÎ YA LIGEL TEYRAN, MIKSIYAN NAVÊ FEQNÊ TEYRAN LI WÎ KIRINE....



PIR GÛ HINDIK GÛ...

HIMM... FEQNÊ TEYRAN

DEH SAL DI SER RE BIHURINE...

ÊDÎ MIKSÎ HÎNÎ VÊ DÎMENÊ BÛNE...



LÊ BI DERENGÎ PÊ HESIYANE KU TEYR VEGERÎYANE SER HALÊ XWÊ YÊ BERÊ. DEMA KU ÇAV BI TEYRÊN BI VÎ Û WÎ ALI DE DIFIRIN, KETINE, KEWÎŞA FEQÎ FÊM KIRINE...

KURO! MA MURVE?

BAZ DE!



XWENDEVANÊ HÊTA! HETA NIHA MIN SERPÊHATIYA FEQNÊ TEYRAN VEGOT, LÊ HÎNA NEQEDIYA!..


ÎRO LI NAVÇEYA WANÊ MIKSÊ ZIYARETA WÎ HEYE. Û GELEK DAR, JI BO KU GORA WÎ JÎ TANÊ BIPARÊZIN, BI SER DE XWAR BÛNE...

... HER ROT BI SEDAN TEYR, LI SER ŞAXÊN VAN DARAN VEDIŞIN. LÊ HÛN MÎSQALEK JÎ ZÎRÇA TEYRAN, LI SER NABININ. KU HÛN LÊ BINÊRIN...

-DANI-

Ji tirkî hatiye wergerandin

oolo



Reşekujiya Berfê

Pencereya Peyvê



EHMED HUSEYNÎ

Ber bi keviya spî ya rasteqîniya nalîna min ve dihat. Bendewariya ku di mista berbangê de xelmaş dibû û bêzariya hetavên girokirî ji bîr dikir. Serçavkên bagerê, bi awirvedana şikestî ya katjimêran dihejmartin û mirina qijalk û kevokên bejî, hêlîna xwe bi metirsiya axê dini-mand.

Min Hesên Zîrek û Kawîs Axayê matmayînê, min nehênîyên destanbêjên seqemê û giryan jî, ber bi pêjnên mirinê ve radikişandin. Li xwe, li kêra temenê xwe, li subeh û li kulan û kerker (kefen) û darbista dîmenê digeriyam.

Keştî, ji deryayê ber bi peravên pirsê ve dihatin û Cûdiyê xewna te, Xwedayê xwe bi bendewariyê radipêça. Tu li kezîyên lêborîna xwe temaşê dikî, tu êvarên dilberan, bi tayeke sar û bi xweliya bêhûdeyîyê dinixumîni. Tu bawîska stêrkan, di windabûna çûrişinê de ber bi hişê xwe ve semîşiv dikî, tu leylanê û gumanê di xêzên jînenîgariya bajarên birîndar de vedîşêrî û tu balendeyên persîkestî yên bîra asoyan, hînî zuryan û reşebayan dikî.

Ferhenga reşbîniyê ya ku di peyvên şevistanê de dihêwirî, ya ku li ser lêvên te, wek zeviyên sirûdên xatîrxwestinê zuha dibû, ya ku rûbarên axîna xwe li ber destê bahozan dihişt û li wateyên serdemê ewle nedibû, ew ferheng, ew leheng, ew jena qeşeng, ew keroşka pereng, ew zenga bêdeng, di efsaneyên xerxarên te de, di bazînen heyva te ya çardeşevî de û di pûnga keservedana te de radipere.

Serpêhatiyên keskesora sînga te, govendger û cejnên ji dayikbûna te, hejîrên banga te û qulingên dadayî yên sîbera Mezopotamyayê, bi xewrevîna min şa dibin, di xwîna pênuşa min de, di şikeftên hêminiya peyvên de, di dîdariya mêrkuj de, wek çûkên berbeyaniyê, li ser şaxên evîna mirî li ba dibin.

Ber bi dara şîngîriya min ve dihat.

Bîna beybûnan dihingivî reşgirêdana helbestan.

Hecheçikên qonaxê, wek sermetan xwe diavêtin tîna hinarkên wê.

Gerdeniya demê li xwe mikur dihat û bîstanê kenê, wê bi şevnemê dideqdiqand.

Tiliyên penaberan ên ku li memikên te digerin, ên ku lawik û heyranan ji dol û pesarên kuştinê werdigirin, ên ku xuşîna destên te, ji hembêza pêlan direvînin, te ji guliyên berfê û ji seqemgirtina lîlavê diparêzin.

Di çemê dilê te de radikevin û nivîştên xwe bi herikîna navê te amade dikin.

Ey daristana laşên berbadbûyî yên ji şaneyên berfê!

Ey zemawenda ji ardê demê ku pencereya bêrîkirinê ber bi ximava tawanbar ve dikişîne!

Ey berfa ku temenê me bi melhêbên zîrek ên şûnewaran didêre!



Derengiya şevê yê. Xencera bêdengiya hişk a vî welatê di çeşnê mamîkekê de, di gewriya min de asê maye. Li wî rexê dûr, rexê zarokîtiya tal û şêrîn, aniha, wêneyên me di hêlînen çavan de rengên xwe wenda dikin û velerzîna dengê me jî, nagihêje sopezanên qederê.

Em heyvanê dudilîyê ne, ey toza wî rexî!

Em kaviên poşmaniyê ne, ey berfa vî rexî!

Em ber bi te ve tîn, ey goristana wî rexî!

Em ber bi xwe ve tîn, ey reşekujiya vî rexî.



Clinton, Tetrîs û HADEP

Li gorî nûçegihanê Pîne-Pressê Clinton di 19'ê Sermaweza 1999'an de, piştî ku Yeltsin diqehêrîne, HADEP'a Stenbolê ziyaret dike. Clinton biryar dide ku wê bê parêzkar biçe serdana HADEP'ê. Ji ber vê yekê jî tenê du sed parêzkarê Clinton li gel wî diçine HADEP'ê.

Clinton û parêzkarên wî, di saet deh û nivê şeşê de diçine HADEP'ê. Malxirabê Clinton, ma tu nabêjî di deh û nivê şeşê de kî tê deriyê HADEP'ê vedike?... Jixwe polîtîkaya emperyalîstan li ser biçûkxistina gelên bindest hatiye sazîkirin. (Neyses, em nekevîne nîqaşên polîtîk...) Di deh û nivê şeşê de çayger ji Clinton re derî vedike:

- Kerem kin, hûn li kê digerin?
- Hello... How are you? I think, I'm late. I'm sorry. (Merheba.. Hûn çawa ne, ez bawer im ez hinekî bi

derengî ketim. Biborin.)

- Te go çî?

- Ha ha ha... This cook have got is "Pîne". Ha ha ha.. (Ha ha ha... Ez bawer im te ev espîrî ji Pîneyê girtiye.. Ha ha ha..)

Xalê Çayger bêtî ku ji Clinton tiştêkî fêhm bike, wî diezibîne. Clinton bi qasî niv saetê di qorîdora zirav a HADEP'ê de li ser piyan disekine. Hillary û Chelsiyê jî weha li ser piya disekin. Çend kes tene partiyê, lê kes ne Clinton û ne jî Hillary û Chelsiyê nas dike.




Dawiya dawîn, di saet diwanzde û bîst deqîqeyan de, rêvebirêkî partiyê tê. Xwedê bike, ev rêveberê xwedê jê razî, Clinton nas dike. Bi zimanê tarzankî, wî dawetî odeya kargeriyê dike. Clinton li odeya kargeriyê rûdine, rêveberên partiyê jî dikin ku ji Clinton re çayêkê bînin, lê çay nemaye. Dîsa neyses ku tê hişê çayger ku li NÇM'ê çaya qaçax heye. Derhal telefonêkê ji NÇM'ê re, çaya qaçax tê xwestin. Lê ji çaya qaçax girîngtir, pêwîstî bi wergêrêkî heye. Rêvebirê partiyê çî dikin û çawa dikin nizanîm, lê di dawiyê de wergêrêkî diwanzde salî dibînin. Wergêr jî du saet paşê tê. Wergêr, her tiştê ku rêvebirên HADEP'ê dibêje werdigerîne, lê di dawiya her hevokê de dibêje; I want to tetris.. (Ez tetris dixwazim.) Helet rêvebirên HADEP'ê jî fêhm nake ku kurikê diwanzde salî çî dixwaze. Di dawiyê de

çaya qaçax jî tê. Hevdîtin bi qasî du saetan didome. Di wê demê de rêvebera hêja Dayika Şekemas jî tê partiyê. Ew jî diçe bi Hillary re sohbetê tîr û germ dike. Dayika Şekemas dibêje;

Tu şekir ez şekirnas! Ez bindest tu heqenas! Ezê çawa bikîşînim derdê bûkêl bê tebeq û tasî û bê kifim û palas

Di dawiyê de, ji bo ku rêveberên HADEP'ê kêfa Clinton bi cih bînin û pê çand û hunera kurdan bidine naskirin, komeke muzîkê ji NÇM'ê dixwazin. NÇM jî ji ber ku nikare di navbera bîst û şeş saniyeyan de komeke muzîkê amade bike, bê pîrs û sewal ji bo konserekê Ozan Mistefa dişîne HADEP'ê. Ozan Mistefa jî li texsiya xwe siwar dibe û diçe HADEP'ê. Lê nizane ku ji bo çî diçe HADEP'ê. Dibêje, qey yek ji grevên birçbûnê ye dîsa. Ozan Mistefa bi strana "siwara" dest bi qonserê dike. Clinton jî ji ber vê stranê ji xwarina êvarê ya li Hotelê Hiltonê ye dimîne. Piştî ku strana "siwara" diqede, Clinton, Chelsî û Hillary di dehe sevē de, wekî ku ji greva birçbûnê derkevin ji HADEP'ê vediqetin.

Di encama vê hevdîtinê de, piştî du hefteyan Clinton du kamyon tetris dişîne ji HADEP'ê re. Rêvebirên me niha zû tînen û deriyên saziyên xwe vedikin!.. Xwedê ji kurikê diwanzde salî be ku, ji diplomasiya AGÎT'ê du kamyon tetris di destê me de ma...



Seyitsaatci@hotmail.com
XEZ BERRAJ
SEYİT SAATÇI



Bêguman Pîne berhemêke heta hûn bêjîn. Bes, pîroz e. Rast e, ez jî di wê fikrê de bûm, ku di warê mîzahî de valahiya berhemêke bi vî rengî hebû û va ye ev valahî bi afîkariya we hate dagirtin. Ji bo rewşa girtiyan ez zêde ne hêvîdar im, kengî we sererast be, ez jî nizanim.

Abbas Alkan

Gelî xebatkar û nivîskarên Pîneya rindik û rengîn. Em wekî xwendekarên zanîngehê, derketin û weşana Pîneyê ji dil û can pîroz dikin û jê re emrekî dirêj û serkeftinê dixwazin. Em hemû hejmarên Pîneyê, bi kêfxweşî, dişopînin û dixwînin. Digel wê, ji xebatkar û nivîskarên Pîneya xweşik re daxwaz û gazinek me heye ku:

Dîne (ol) îslamê, ku dîn û bîr û baweriya piraniya gelê me ye, divê nebe mijara qerf û heqaretê. Lewre em di hinek nivîsan de rastî helwest û tewrên bi vî rengî hatin. Bi rastî em dîndarên kurd gelek xemgîn û dilşikestî bûn. Ger mirov, ji bo me kurdan, mijarên qerfê û mîzahê bixwaze, ew pir in: Ji bêbextî, nezani, birakujî û îxtilafa navxweyî bigire heta emperyalîst, dostên sexte, hevalên bêkêr û kurdên

bêkurdî û hwd. hemû mijarên qerfê ne. Lê nîrx û qîmetên miletê me, bîr û baweriya wî, ne ji van mijar in û divê nebin jî. Lewre Pîne xîtabê hemû gel dike û ya gel e. Ji ber vê yekê, lazim e hemû bîr û baweriyên gel hêmbaz bike û ji wan re hûmetkar û rêzgir be. Lewre ji her cure bîr û baweriyê xwendevanên Pîneyê hene. Em hêvîdarin ku Pîneya me ya xweşik, wê nekeve dafik û kemîneke weha, lekedar nebe û me xwemgîn neke.

Nevzat Eminoglu, Sever Işık, Ömer Güneş, Selahattin Çoban, Aziz Adıgüzel, Veysel Güneş /Xwendekarên Zanîngeha Marmara û Yeditepeyê

Pîne

Dibêjin "Pîne buba" ye Buhabûna wê

buhayê yek malbora ye Ji bona ku di me de biş nemaye Loma navê kovara min wek jiyana min Pîne maye

Alîkarê Pîne tune wek rojnamevanê romê Pîne li ser devê me, çavê me, gubê me Xelk derket ser hûn, em çima şûn de mane? Bêbedel tiştê çareser nabe. Huseyin Sêwreg/ Sêwreg

Gelo ji îro pê ve em bibêjin Pînebaş? Bi rastî ji ber ku qada ken û henekan hêsan nûn e, ez xebata we pir pîroz dibînim. Ewîl Tewlo hebû. Ew jî mîna bayê bezê xuya bû û wînda bû.

Ez hêvî dikim, temenê Pîneyê dê wekî Tewloyê nebe. Hebûna kêmasiyên Pîneyê asayî ye. Ji bo ev kêmasî tim û tim asayî nemînin, dixwazim hinek rexneyan jî bikim: Buhayê Pîneyê zehf e; bi qasî ku xwendekar ji ber kirîna Pîneyê, nikaribin pereyê kirê, elektrîk û avê bidin. Ev jî dibe sedema pevçûna xwendekar û xwediyê malê. Ger hûn naxwazin xwendekar xwendina xwe di nêvî de bihêlin, Pîneyê hinekî erzan bikin.

A duyemîn, Pîne zehf kêmrûpel e. Dema ez ji bayî distînim û bi peyatî tîm malê, di rê de Pîne xelas dibe. Êdî mecbûr dimînin, Pîneyê dubare, sêbare bikim.

A sêyemîn, ku Doğan Güzel Qirix bidomîne, wê baş bibe. Încax bersiva pêvajoyê Qirix dikare bide.

Salih Karakaş/Erzerom

Ez bawer im Pîne wê kurdên ereb, tirk, faris û kurdên bêşeref, bêKurdistanê Pîne bike. Û wan bi kenê neteweyî paqij bike.

KNK jî bila ewqas di ser Pîneyê de neçe û di cihê xwe de rûnê. Pîneyê herî her tiştî kenê neteweyî afirand û di vî warî de gavên mezin diavêje û bi xebata xwe da xuyakirin ku saziya kurdan a herî mezin e.

Bimînin di nav pîneyan de.

Yusuf Kaçmaz/Stenbol

Hello pînevan'lar! Xebatkarên serbilind û serhişk!

Bi silavên germ û tal, serê xwe li ber kêrê datînin û ji bo Pîneyê we pîroz dikin. Îro nêzî sê rojan e Pîne derketiye; bihar hatiye mala me. Qerf û henek ketine nav cihên me. Hejmara we ya duyemîn baştir bûye, em bawer in yên bîn, wê baştir bin. Em li benda we ne û bi we serbilind in!


Serhat Kartal/ Denizli



WELAT Rojnameya Heftoyî
www.welat.com **200**
27 sermawez 2001 3 bîr, 1999
BUHA 00001 350.000 TL

Îradeya gelê kurd hate bînpêkirin

✓ 25'ê meha sermawezê Dadgeha Bilind a Tirkiyeyê biryara îdamê ya der barê Serokê Giştî yê PKK'ê Ocalan de çespend. Bi vî yekê re Konseya Serokatîyê ya PKK'ê, Serokê DMME'ê, Serokê IHD'ê,



Ji civîna REHE'yê çend têbînî

REHE hindikantî û kurd

HER ŞEMİYÊ LI BAYIYAN E

BEQ Ên destê sibê hatine dinyê




Zivistan tê, divê hûn bêhtir li rewşa xwe ya tendurustî miqate bin; goreyên ris di pê xîn. Ku hûn bikaribin, di ser kum re şewqe bidin serê xwe. Ji xeynî aqilê we, şewqeyê we jî, wê di ser serê we re be. Xwe ji zekemê biparêzin û avê ji tasa ku yekî din tif kiribê, venexwin.

QUŞXANE Ên berî nivro...



Ev pêvajoyeke pakapî-so ye. Heta hûn karibin, xwe ji çapemeniya tirk bistîrînin. Ku hûn naxwazin psikolojiya we xera bibe û ku hûn evîndarê zimanê xwe bin, xwe ji Medya-TV û filmên Üris biparêzin.

MOZ Ên pîştî dana pez




Hûn di nav xelaya evîne de dijîn; di ser de jî ya aborî. Divê hûn hinekî bargiraniya jiyane jî ser xwe biavêjin. Hûn ne hemal in. Ku dil dikin, xwe hinekî berdînin. Ku dîsa bêhna we nehate ber we, derkevin devereke bilind û heta deng ji we tê, biqîrin an bizirin.

CAŞIK Ên ber êvarê...



Karê we, hûn aciz kirine. Hûn ne dikarin dev jê berdînin û ne jî tîra we dike. Karekî din jî tune ye, hûn dibezin zarok û malbata xwe. Carinan jî karbidestên xwe. Lê ya rast, sedem ne tu kes ji wan e. Ev, xelesa globalîzmê ye. Ku tu mîr bî, bibeze wê.

ZIRNE Ên nivê şevê...



Hûnê ji kar bêne avêtin. Têkiliya we û malbata we, wê xera bibe. Dadgeha Gelekî Bilind, ewê biryara li ser birêz Ocalan dîsa dubare bike. USA û UN wê kêfxweşiya xwe ji Tirkiyeyê re bînin zimên. Dewletên ereb, ecem û tirk wê li ser yekîtiya axa Iraqê, Îranê, Sûriyê û Tirkiyeyê li hev bikin.

HUHDUK Ên heft mehî hatine



Dem, wekî her kesî ji bo we jî xerab e. Ku heştêpêk (ahtapot) we bitiqîtiqîne jî, kenê we nayê. Dilê we vala ye. Divê hûn ji xwe re li oleke ceribandî, bigerin.

YNK rojnameya bi kurdî WELAT ku li Silêmaniyê tê weşandin, girt.

